

Lîsansê telefonên baqil ji bo dê û bavan

Dê û bavên birêz,

Hûn dixwazin ku ji zarokên xwe telefonên baqil yekem bikin û ji bo vê pîrsên we hene:

Di kîjan emrî de telefona baqil?

Kîjan cîhaz baş in ku bînin kirin?

Kîjan Apps tîn pêşniyar bikin?

Di malbatê de hewcedarî ji kîjan qaîdeyan hene?

Kîjan naverokên agahiyan baş in?

Telefonê baqil pir balê dikişîne ser xwe û jiyana malbatan diguherîne.

Hûn wek dê û bav, dikarin kursa telefonên baqil çêbikin û telefonên baqil çawa tê bikaranîn.

Bi dê û bavên din re fikirê xwe parve bikin. Çareseriyê baş ji bo malbata xwe bibînin.

Lîsansa telefona baqil alîkarî dike ku mirov bersîvên pîrsên xwe bibîne!

Ji bona kîjan temenî telefonê baqil?

Di telefona baqil de gelek cîhaz hene. Ez dikarim ji telefonkirinê zêdetir bi telefona baqil tiştan bikim:

Ez dikarim fotoxrafan çêbikim, têkevim înternetê, televîzyonê binêrim, muzîkê guhdarî bikim, lîstîkan l'bilîzim û dikarim hîn pir zêdetir tiştan bikim.

Zarokê ji bo telefonê baqil baş bikarbîne, divê bi gelek tiştan bizanibe. Zarokên dibistana seretayî ji ber gelek derfetan nikarin serkeftî bibin.

Kesên pispor şîretê dikin ku, bo zarokên ji deha salî mezintir, divê ku telefona baqil wan hebe.

Lê her zarokê cuda ye – û hûn baştir zarokên xwe nasdikin.

Gava ji zarokan telefonê baqil hate kirin pêwîst e ku dê û bav ji bona zarokan qaîdeyan zelal diyar bikin.

Divê kîjan cîhaz bê kirin?

Hilbijartina Cîhazan

Telefonên baqil nû û bi kalîteyê baş, bi 100 Euro jî hene. Li ser înternetê cîhazên kevn lê ewleyî tîn firotin. Zarokên pir caran iPhone'ê an jî Galaxy'ê bi taybetî baş dibînin. Lê cîhazên din jî, dikarin wek wan bixebitin. Û dema ku cîhazên biha xerab bibin an jî bînin windakirin, mirov aciz dibe.

Zarokan tev li mesrefan bikin

Dema ku telefonêk baqil ware kirîn û xerçekirina dirav ji bo telefona baqil çêbibe, zarokên we dikarin ji wer e bibin alîkar – heke tenê alîkariyeke piçûk be jî. Wiha zarokên we hîn dibin ku bi qedirê diravên xwe bizanibin û fêhm bikin ku her tişt ne belaş e. Lê heke telefona baqil ba zarokên we hebe, divê hûn wek dê û bav rêzikan diyar bikin. Ji bo ku mesref werin kontrol kirin tarîfa pêşî alîkariya mesrefê dike. An jî dê û bav ji bo zarokê xwe peymanê dirêj dike.

Parastina Cîhaz

Ji bona telefona baqil ji ber ketinê xerab nebe, baş e ku hûn qewlikekî bistînin. Fîlmeke parastinê li ser ekranê alîkariyê dike, ku ekran ji xêzikan bê parastin.

Kîjan appên baş in?

Ewlekirina Cîhaz

Ku ji bo zarokan telefonêk baqil bê hemetkirin, hinek derfet hene. Ku ji bo daxistina appan bê kontrol kirin, App-Store bi şifreyekê dikare bê hemet kirin. Hûn dikarin hindur-app-kirîna jî wiha biparêzin.

Hûn dikarin bi kar anîna fîlterê û browsera zarokan bigihînin internetê.

Hilbijartina Appan

Bi zarokên xwe re appan biceribînin. An jî bihêlin zarokên we appên bikar tînin, ku nîşan we bidin. Bi nêrînek krîtik benêrin: Kîjan kirin ji bo appê hewce ne? Pir reklam an jî hindur-app-kirîna hene? Bi zarokên xwe re bi tevahî telefona baqil paqij bikin. Appên ku hûn bi kar naynin, ji telefona baqil derxin.

Agahdariyên xwe berdewam zêde bikin

www.schau-hin.info: Qaîdeyan û ewlekarîya sazîkirinê

www.klicksafe.de: Agahî li ser appan, parastina softwarê & hê zidetir

www.app-tipps.net: Tawsiyên ji bo appên zarokan yê baş

www.mobil sicher.de: Ewlekarîya li ser telefona baqil & tabletan

Di malbatê de hewcedariya me bi ji kîjan qaîdeyan heye?

Cihên bê telefon çêbikin

Qaîdeyan çêbikin, kengî û li ku derê destûr hebe, ku telefona baqil bê bikaranîn. Dema bi hev re xwarin tê xarin, cîhaz mirov aciz dike. Divê bi şev jî were girtin. Fêr bibin ku hûn bêyî acizî bi zarokên xwe re demên xweş derbas bikin. Hûn bona zarokên xwe mînak in – hûn çawa telefona baqil bi kar tînin?

Ji stresê dûr bikevin

Zarok dixwazin WhatsApp'ê bi kar bînin. Derfetên din jî, ên wek WhatsApp'ê hene. Ku zarok pir peyaman bigirin dikarin bistrês bibin. Divê di vê mijarê de hûn baldar bin.

Di komikên WhatsApp'ê de jî lihevnekirin û hin pevçûn çêdibin. Gengeşî û çareserkirina pirsgirêkan rûbirû ji ên dijital baştir in.

Mezinbûna bi tenduristî

Divê ku zarokên we bikaribin bêyî telefona baqil jî kêfxwaş û bextewar bibin. Hewcedariya

wan ji tevger û bêhnvedanê heye. Berî razanê divê telefona baqil neyê bikaranîn. Ronihaya cîhaz nahêle mirov razê. Muzîka bi dengê bilind ku bi berguhkê tê guhdarî kirin jî xisarê dide guhên mirov. Bala xwe bidin halê SAR'ê, ku çiqas dîrêjan diweşîne.

Kîjan naverok baş in?

Li ser fotoxraf bibal bin

Heqê her mirovî li ser wêneyê xwe heye. Loma zarok nikarin bê destûr mirovên fotoxrafên wan çêbikin, bişînin an jî biweşînin. Ew rêzik ji bo we dê û bavan jî derbasdar e: Lê ji kerema xwe re wêneyên zarokên xwe ên „pir şîrîn“ û xweşik ku dawiyê bikaribe wan aciz bike ne weşînin. Ev ji bo wan ne baş e.

Ku zarok fotoxrafen xwe diweşînin bala xwe bidinê gelo xwe, baş çawa nîşan didin.

Li naverokan miqate bin

Dibe ku di telefona baqil de zarokan pêşberî pirsgirêkê bibin. Fîltre herî baştir jî nikarin pêşî li vê bigre. Wê demê hewcedariya zarokan bi we heye, divê hûn ji zarokên xwe re her dem rîya alîkariyê vekirî bihelin daku karibin ji we alîkariyê bixwazin.

Bi hev re kêfxwaş bûn

Telefona baqil tevî zarokên xwe bi kar bînin, ku hûn tev demeke xwaş derbas bikin. Bi wan re bilîzin û tev wan muzîka dema ciwaniya xwe guhdarî bikin. Têkiliyeke bibawerî ji bona zarokan gelek girîng e!

Hevdîtina bi dê û bavan re

Ji bona gihîştin û pêşxistina zarokan, dê û bav şîretan ji dê û bavên din digirin. Hema di her malbatê de mijarên dişibin hev tîn axavtin. Loma jî bi hev re parvekirina ceribokên xwe gelekî bîmantiq û girîng e.

Li ba Elterntalk NRW'ê dê û bav digihêjin hev û li ser mijarên perwerdeyê dipeyivin. Ew bi xwe dê an bavek jî wek moderator di hevdîtîna de hevalkariyê dike.

Elterntalk li gelek bajarên NRW'ê çalakiyan dikin, dibe ku li nêzîkî we jî hebe?

Bêtir agahî li ser www.elterntalk-nrw.de.

Têkilî ji bo Elterntalk NRW team@elterntalk-nrw.de

Telefon: 0221 92139227

Köln | 2018

Elterntalk NRW projeka „Arbeitsgemeinschaft Kinder- und Jugendschutz NRW e.V.“, ye.

Poststraße 15 – 23, 50676 Köln, www.ajs.nrw.de

Wezaret ji bo Zarokan, Malbat, Penaber û Întegrasyonê a Eyaleta NRW destek dide.